



Dr. Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :

- * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
- * Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
- * Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Hejmar (113)

Sal 20 Gelawêj 2015z - 2627k

Buha (50)L.S

Salvegera Yekê ya Babelata Şengalê

▪ Rozad Elî/Desteya sernivîser


Sal: 2014, mihe: 8/Gelawêj, roj: Yekşem, cih: Şengal. Li wê rojê dîsa hêzên hov û reş ên ku bi sexteyî doza Îsalmtiyê dikin, ala wê radikîna û di bin navê Xwedê û Pêxember de ferman û babelateke giran bi ser gelê me yê Kurd de rakirin, êrişeke mezin bi ser Şengala xopan de rakirin. Vê carê ew bêtar û babelat ji para Kurdên Êzdî bû û mîna fermana 74an di dîroka Êzdiyatiyê hate tomarkirin.

Di wê rojê de, terorîstên Rêxistina Dewleta Îslamî ku bi DAIŞê tê nasîn, hêrişeke berfere birin ser navça Şengalê, gund û bajarên wê dagîr kirin, û bi deh hezaran ji xelkê Şengalê mal û warên xwe berdan û koç kirin, bi hezaran jî jin, mêr, keç, xor, biçûk û mezin hatine girtin. Ji wan bi sedan hatin kuştin, dor pênc hezar mirov jî ta niha windayî ye û çarenûsa wan ne diyar e. Dor du hezar keç û jinên ciwan jî mîna malxo^{sibiye} hatin birin û li bazarên bajarê Mûsilê û Reqayê bi peran hatin firotin.

Vê babelatê û van kiriyarên hovane û çepel birînek ②



Bîranîna Helbestvanê Gewre Şêrko Bêkes



Li roja 4/8an du sal di ser goçkirina helbestvanê Kurd ê mezin Şêrko Bêkes re derbas bûn.

Şêrko Bêkes li 2.5.1940 li bajarê Silêmaniyê ji dayîk bûye. Diwana xwe ya helbestî ya yekê li sala 1968an belav kiriye. ⑨

Gundê Babasî

Ev zanîn ji devê Eliyê Miradê Mişko yê ku di sala 1941an de li gundê Dêrûna Axê ji dayik bûye, û ji sala 1945an ve li gundê Babasiyê cîwar bûye, hatiye girtin.. Rûpela facebookê ya Çar çira.

Babasî ew navê gundê rasteqîn û resene û hemî şênîyê herême bikartînin, paşê ji hêla rêjîma Sûriyê ve kete ber siyaseta Erbîkirinê, û bi Sîna'î hate binavkirin.

Ev gundê bi xurista xwe ya qeşeng û spehî, sînorbire ⑩

Partiyên Kurdî Di Kîjan Delavê Re Derbas Dibin.

▪ Merwan Berekat

Dema mirov li pirogramên partiyên Kurdî yên ku hejmara wan bi dehan e vegere, wan baş bixwîne û raçav bike, dê bibîne ku ewqas ji hev ne cuda ne. Ango bi şeweyê xwe yê giştî armanc yek e: (Xebat ji bo mafên siyasî, rewşenbîrî û civakî yên gelê Kurd li Sûriyê). Navên wan jî wek hev an jî nêzîkî hev in, û tev jî dibêjin em demokrat in.

Ji aliyê din ve, hemû partî di pirogramên xwe de doza yekîtiya tevgera rêzanî ya Kurdî dikin. Lê karê wan yê piratîkî tucarî ne li gora armancê ye..! Çima? Li şûna ku wê armancê bi cî wînin, mixabin bervajî wê diçin. Di salekê de partiyek dibe du yan jî sê partî, û hejmara her partiyekê û nemaze yên ji partiya xwe ya mak diqetin ji hejmara kesên



malbatekê kêmîr in. Ew demekê hev tewanbar dikin, û dirêj nake her yek ji wan doza yekîtiyê dike, lê tenê bi gotin û li ser rûpelên belavokên partiya xwe. Ji ber ku eger ew birastî berketiyê wê armancê bana, ji bo çî ji hev diqetin, tevgera Kurdî lawaz dikin û nexweşiyên li govdeyê wê pir dikin???

Di van çend salan de, çend pirojeyên yekrêziya tevgera rêzanî ya kurdî bi alîkariya Herêma Kurdistanê û li ser serê wê serokê herêmê birêz Mes'ûd Berzanî hatin danîn, wek desteya Bilind, Lêvegera Siyasî û berî

wê jî Encûnena Niştimanî ya Kurdî. Bêguman her ku ew yekrêzî dihatin ragahandin hêviyên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê geş dibûn, û hewil dida ku xwe li dor tevgerê bide hev. Lê sed mixabin, ezîtî û partîtiya teng û kujer berê wan piroje û yekrêziyan û bi şeweyên curbecur didane riyên şerpezekirin û têkçûnê, û her aliyekî yê din gunehkar û tewanbar dikir. Bila yek partî û yek alî xwe ji vî gunehî bê par neke, belkî rêje ne wek hev bin, lê têkbirina wan pirojeyên yekrêziya tevgera Kurdî di stiwê wan 11

Salvegera Yekê... Dûmahîk

kûr di dil û wijdanê her kurdekî û her mirovhezekî de vekir. Raya giştî ya cîhanî, ya Îslamî jî di nav de, ji wê karîsetê bihitî. Hêjayê gotinê ye, ku roleke jina Kurd a Êzdî û perlementera Îraqî xanim Viyan Dexîl di riswakirin û şermezarkirna bûyerê de hebû. Gelek navend û rêxrawên mirovî û navdewletî û serokên dewletan Xanim Viyan pêşwaz kir û xemgîniya xwe li derbarê babelata Şengalê xuya kir.

Ji hêla xwe de, hikumeta

Herêma Kurdistanê jî bi erkên xwe yên mirovî û netewî rabû. Wê jî, bi alîkariya xelkê Şengalê, hêzên YPG û balefirên navdewletî bi de hezaran mirovên ku li serê Çiyayê Şengalê hatibûn dorpêçkirin, rizgar kirin, hemî penaberên Şengalê li herêmê bi cih kirin, û li bendê ne ku tevahiya Şengalê rizgar bibe û xelkê wê vegere mal û warên xwe.

Ustubariya sazî û rêxistinên cîhana û navdewletî, her kesê mirovhez e û rêzdariya mafê mi-

rovan digire ye, ku ew Kurdên Êzdî ku bi destê DAIŞê hatine revandin, û keç û jinên ku wek enfal û malxo ji hêla lawirên daişî ve hatin birin û li bazar û çarşiyên tene firotan, ustubariya wan hemiyan e ku ew werin rizgaerkin û li mal û welatê xwe vegerin. Ji ber ku şerê li dijî teror û terorîstan ne tenê ustubariya gelê Kurd e, ew erkeke mirovî ye û hemî cîhana azad di ber de berpisiyar e.

Bimire terorîst.. Bijî xelkê me yê Şengalê.

Navça Ewle li Bakurê Sûryê

■ M.Efî

Gelek axaftin di alavên ragihandinê de li ser ``navça ewle-navça bê DAIŞ`` li Bakurê Sûryê tên kirin, nêrîn û şiroveyên têvel jî derdikevin holê. Ew mijara li ba gelê Kurd û hêzên wî yên siyasî û ne siyasî jî bûye cihê axaftin û guhdanê. Eger ew mijara ji medya cîhanî re bûye mijareke balkêş û dewlemend, ew ji niştecihên Bakurê Sûryê re bi tevahî- Kurd jî di nav de- bûye cihê pirs û gumanê. Ji ber ku ji xelkê ne diyar e ku ew navçe wê çima û çawa çê bibe? Kî wê çê bike û lê destlatdar be? Pirsê giringtir jî ew e, ku ma çima ew mijara niha derkete meydanê û çima jî ewqas destlata Tirkîyê li ser wê pirojeyê bi îsrar e?

Pirsên Rewa!

Bi rastî jî, ev pirsên jorîn pirsîne rewê û giring in, ta niha bê bersivên zelal û diyar in. Û tiştê tenê ji pirojeyê xuya bûye, ew e ku herêma ewle -eger ava bibe- ew li ser daxwaza destlata Tirkîyê radibe û ji bo pêkanîna armancên wê yên siyasî di tenga doza Kurdî li Sûryê tê meydanê; Nexwe, û eger rastî ne wilo ba, gerek e navçeke wilo bi (ewle) ji destpêka serhildana gelê Sûrî de, ji dema ku R.T.Erdoxan xêzên sor ji sazûmana Sûrî re datanîn de bihata avakirin.


Çima li Parêzgeha Helebê!?

Paşê, çima ew herêma tampon li parêzgeha Idlibê ya ku ji sazûmana Sûrî hatiye rizgarkirin

ne tê çêkirin? Çavdêr, Emerîka û xelkê Sûryê jî têgihîştine, ku mebest û armanca Tirkîyê ji wê pirojeyê ew e, ku navçeyê Kurdan li Bakurê Sûryê bi destên hêzên kurdî negihêne hev, wan ji hev bike û navbereke -navçeke tampon- ku di bin kontrola Tirkîyê û hevalbendên wê de be, ava bike, paşê jî pirojeya siyasî ya Kurdên Sûryê asteng bike û têk bibe. Erê belkî destêwerdana Tirkîyê kani be kevîran li pêş dolabên doz û mafê Kurdan li Sûryê dîne û wê ta dem û radekê asteng jî bike, lê ew di warê stratîcî û demdirêj de nikane ziyaneke mezin bigihîne, ji ber ku ji binî de tu pirojeya Kurdan ên serxwebûnê li Sûryê tune, daxwaza wan rêzgirtina mafên wan ên netewî di çarçewa parastina yekîtiya Sûryê de, di siha rijîmeke perlemanî, nena-vendî, piralî û demokratîk de ye.

Navça Ewle ne Navçeke Kurdî mîna Efrîn û Kobanê ye...

Ji bilî wan rastiyan, ew navçeya ku weke ``Navçeya Ewle`` hatiye nîşandan, Kurd wî mîna navçeke kurdî nabînin. Do-



ra 35 gundên Kurdan û belkî bi qaserî wan jî yên Tirkmenan lê hene, lê gund û bajarên wê, wek: Ezaz, Bab, Minbic, Cerablîs... pîraniya niştecihên wan Ereb in û wek warên Ereban tên dîtin. Loma jî, ra ku hêzên kurdî li wan deveran bi DAIŞê re têkevin şerekî mezin, pêwîst e ew bi hêzên Artêşa Azad ên wê deverê re alîkar û paşê destlatdar bin jî. Yan jî, paşê şer wê di navbera hêzên kurdî de li aliyekî û hêzên Ereb û Tirkmanên ku alîgirên Tirkîyê ne li alîkî din, derkeve, ew jî bi carekê ne li gor berjewendiya gelê Kurd û paşeroja mafên wî yên rewê.

Pir baş e ku DAIŞ têk here

Wê pir baş be, ku eger navça Bakurê Helebê û tevahiya Sûryê ji DAIŞê û ji hêzên tundrew paqij bibe, ew bi destê kê dibe bila bibe. USA kane pir tiştan bike, û di vî warê leşkerî de, ligel hinekan biaxive. Hevpeymanî navdewletî ya li dijî terorê, bi têkliyên xwe yên naskirî bi fermandarên YPG-YPJ xwedî piroje, tektîk û

Çima hin Kurd Leşgeriya Neçar Napejirînin?

■ Şêrwan Berekat

Di ev rewşa ku çeteyên terolîst bi kiryarên xwe yê hovane gel û herêmên Kurdî ji xwe re kirine armanc, û talana me ji xwe re rewa dibînin, divê her Kurdek, jin, mêr û ciwan bi erkê xweparastinê rabin, û tu kes xwe ned paş. Lê dema ev kar yekalî û ne hevbeş be, bêguman dê ne wek tê xwestin û lawaz be. Ji ber wê jî, dema ku biryara leşgeriya neçar ji aliyê rêvebirîya xweser ve hate standin, piraniya Kurdên ku temenê wan di 18 û 30 saliyê de bûn û leşkerî berê kiri bûn yan ne kiri bûn, wan rîya koçkirinê dane ber xwe. Dema ji wan tê pirsîn: Çima ew piştî xwe didin welêt û ji erkê parastinê direvin? Piraniya bersivan ev e: Eger tevgera rêzanî ya Kurdî li ser hev û hevrêz ba, û hemû kar bi şewakî hevbeş bibana, bêguman emê bimana û me xwe nedida alî.

Eger em li ser vê bersivê rawestin, bêguman ta astekê aliyekî wê yê rast heye. Ji ber ku em bixwezibin an nexwezibin ji deh salan ve her partiyekê heval û cemawerê xwe li ser bingeheke ramanî ya taybet perwerde kiriyê. Û herweha di pirograma hemû partiyên Kurdî de li Sûryê beş leşgerî nîne. Ji aliyekî din ve, piraniya partiyên Kurdî hîn ev rêvebirîya nepejirandine, ji ber wê jî biryarên ku ji aliyê wê



ve têne standin, ew xwe ji ber de berpirsyar nabînin, û di bin sîwana wan biryaran de kar nakin.

Ev nakokî û nelihevkirina di nabera partiyên Kurdî de, roleke neyînî di serûberê civaka Kurdî de dilîze. Eger wisa berdewam be hêdî hêdî Rojavayê Kurdistanê ji Kurdan vala dibe. Ev rastiyeke li ber çavan e, û divê em bi şeweyên curbecur wê bincil nekin, û her aliyek neke stiwê aliyê din.

Ji dema ku biryara Xweparastinê (Leşgeriya neçar) hatiye standin û ta roja îro jî, zincîra koçberiyê ji hev neqetiye. Lê divê baş bête zanîn ku sedemên koçberiyê ne yek û didu ne, û ne yê ku bi her hawî hewil didin ku tenê bixin stuyê rêvebirîya xweser a heyî, ne ji gel ve mane. Piraniya rêvebirên hemû partiyên Kurdî û yê P.Y.D jî di nav de, ciwanên xwe berve

Ewropa têvedane. Vêca li ser ekrana T.Vyan TEV-DEM û E.N.K.Sê hev tewanbar dikin, û her yek ji wan gunehê vê koçberiyê dixwe stiwê aliyê din. Lê ya rast ew e, ku her du alî ji ber ve berpirsiyar in. Ma gelo eger hevrêzî di navbera wan de heba, îro rewşa Kurdî bi şeweyê xwe yê giştî dê ev ba?? Bêguman na.

Dîsa em tekez dikin ku erkê xweparastinê yê her Kurdekî ye, lê rê wê li pêş xwedanalî bihata birîn, eger biryara leşgeriya neçar ne bi şeweyê xwe yê heyî ba, ango ne bi rêbaza neçarî ba. Ya din, lihevkerin serastkirin e... lihevguhdarkirin jî parastin e... tewnarî jî tevlehevî û linavhevixistin e. Zor pêwîst e ku her aliyek li xwe vegere, her aliyek xwe bi tenê nebîne û em li gel hev gel û herêmên xwe biparêzin. Ji bilî wê jî, çare zor e.

Penaberî, Şerma Mirovatiyê!

■ Mihemed.E.Elî

Peyamnêrên TV û aceansên nûçeyan rewşa xirab a penaberan û dijwariyên ku li nava pêlên deryan, li ser rê û li ber sînoran dibînin, zindî diweşîn. Dîmenên wan penaberên ku ji rojhilata Navîn berve Ewropa diçin hikariyên mezin li raya navdewletî dikin û wê dihejînin. Ew wêne û dîmenên şanî didin ku bi çî dijwariyê û bi çî şeweyên çavşikestî ew penaber xwe li metirsiyan dixin û bi ser nepenî û mirinê de diçin. Bi hezaran zarok, mêr, jin di nava avê de noq dibin û li ser rêkan û li ber sînorên reş jiyana xwe ji dest didin.

Ew dîmenên zor kambax dihêlin ku gelek dewletên Ewropî, nemaze jî Almaniya, sînorên xwe ji wan re vekin, wan ewle bikin û zû mafê penaberiyê bidin wan.

Li gora serhejmarên nêzîk rastiyê, li havîna îsal, rojê 1400 penaber di Tirkîyê re derbas Yûnanistanê dibe, dora 2600 penaber jî ji Yûnanistanê derbas sînorê Hungarya dibe û bêtirî % 60 ji wan penaberan Sûrî ne.

Pirsa giring ew e, ta kengî goçên penaberan, Kurd jî di nav de, wê ji Rojhilata Navîn, nemaze ji Sûryê bi van hejmarên mezin ji welatên xwe bar bikin, mişext bibin û berve welatên biyanî biçin?. Ta kengî dewletên Rojavaya wê sîng û sînorên xwe ji wan re vekin û wan li ba xwe bi ci bikin?. Bê guman ji



hemêzkirina penabertiyêke wilo mezin re rade û taximên kanîne hene, rojekê were ew dewletên Ewropî yê dewlemend, wê bi-westin û penaberan pêşwaz nekin, dewletên Ewropî ên xizan jî wê deriyên xwe li ber lehiya wan bigirin û bernedin. Ji niha de gelek gotin û axaftinên tonbiton ji berpirsyarên dewletên Ewropî li derbarê qeyrana penaberan tene kirin, ew dibêjin: Piraniya penaberên ku ji Rojhilata Navîn tene Ereb û Misilman in, û ji ber şerên ku li herême rabûne direvin, loma jî gerek e dewletên Ereb ên dewlemend û misilman wek Siûdiyê, Qeter, Kîwêt, Îmarat û HWD, wan pêşwaz bikin û pirsgirêkên wan ên bingeîn çareser bikin?. Wek hemî çavdêr dibêjin û xelk dizane, ku ew dewletên Erebî bi xwe jî sedemên yekser in ji qeyranê Sûryê, Îraqê, Lîbya re.. destêw-erdana wan li nava wan her sê dewletan, piştgiriya wan ji rêxistinên Îslamî yê tûndrew re, û dankirina wan bi çek, peran û mirovan jî, rewşê li wan dewletên qeyranbar kaviil dike, ew gihandine deraqekî pir xirab û hîştine jî ku li dewleteke mîna Sûriyê bêtirî nivê xelkê wê bibin

mişext û penaber.

Eger raya navdewletî û komkara Erebî, birastî dixwazin çareseriyêke bingeîn ji pirsaya penaberan re bibînin, gerek e hemî cureyên alîkariyan û ewlehiyê ji mişextiyên re peyda bikin, û rojekê pêşde şer li Sûryê, Îraqê, Lîbya, Yemen... rawestînin û çareseriyên aştiyane ji pirsgirêkên wan re bibînin daku ew penaber rojekê pêşde li mal û welatê xwe vegerin.

Piştî nêzîka pênc salan ji şerê navxweyî, rewşa gelê Sûryê gihîştîye warekî pir xerap. Rikberiya Sûrî li gel destên ku di paş wan de, û sazûmana Beis jî ketine ber berpirsiyareke dîrokî, li wan ferz bûye, ku di warê pêkanîna goftûgoyan de pir nerm bin. Pir giring û pêwîst e ku hemî aliyên qeyrana Sûryê li hev rûnin û danûstandinên bi berhem û encam bikin. Yanê jî agirê şer wê tevahiya nexşeya siyasî li Rojhilata Navîn bide ber xwe, û di serî de malabtên destlatdar li hemî dewletên Kendavê, ku wek destwerdar û berpirsiyar ji gurrkirina şer re tene dîtin, wê weran bibin, werin rûxandin û dewletên wan jî wek Sûryê û Îraqê wê wêran û talan bibin.

Destpêka Çapkirina Încîla Pîroz Bi Zimanê kurdî

■ **Parêzer: Adhem Şêxo-Stembol.**

Ola Fileh, yek ji olên ``ezmanî û xudî pirtûk``e. Pêxemberê wê hezretî Îsa (s) ye. Îsa li Filestînî hate dinê, li wir dest bi belavkirina ola xwe kir. Û piştî ku hate kuştin, şagirtên wî gotin û zanînen wî civandin û bi ((Incîl)) hate binavkirin. Li wê demê, şagirtên Îsa li gelek deran belav bûn û doza ola Îsa ola Fileh kirin. Li wan deman, Kurd bi tevahî li ser ola Zerdeşt bûn. Lê dîsa jî ola Îsa bi şeweyekî fer li Kurdistanê belav bû. Û ta niha bi seda, ger nebêjin bi hezaran, şûnewraên ola Fileh ên wan deman li seranserê welatê Kurdan tene dîtin. Ji bilî ku çanda ola Fileh jî di gelek warên civaka Kurdî de diyar e, biratiya Ermenên Fileh û Kurdên Zeredestî û paşê Îsamî jî mîna kek diyar û resen e.

Piştî ku derfeta çapê çê bû, navendên olî yên Xiristiyane li Ewropa û li nav Ermenan jî hewildane ku ola Fileh û Incîla Pîroz derbas nava Kurdan bikin û wan bidin nasîn. Loma jî wan rabû li destpêkê Incîl wergerand Kurd û li nav Kurdan belav kirin. Li gora jêderên dîrokî, ta sala 1911ê duzdeh çap jî Incîla Pîroz derketin hinek bi tîpên Ermenî ne û hin jî bi yên Erebi ne.

1-Cara yekemîn Incîla- Metta- li sala 1856an ji aliyê -civata kitêba pîroz a Brîtaniya û Bîyanî - bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî li Stembolê hate çapkirin û weşandin. Wergera vê Incîla pîroz bi destê -Stepan- bû. Ev kitêb jî 112 rûpelan pêk dihat.

2- Cara duyemîn Incîla -

Marqos- Luqa- Yanna- Metta- li sala 1857an bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî hate çapkirin û weşandin, û wergera wê jî bi destê - Stepan- bû. Ev Incîla jî 398 rûpelan bû, û li Stembolê hate çapkirin. wêne/1.

3- Di sala 1872an ji aliyê - Civata Kitêba Pîroz a Amerîkî- Incîla Pîroz û Karên Resûlan- bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî li Stembolê hate çapkirin. Werger jî bi destê - Bliss- bû. Ev kitêba jî 624 rûpela ye.

4- Niyazên bi Kurmancî: Bi zimanê Kurmancî û bi tîpên Ermenî li Xarpêtê di sala 1880yî de hate çapkirin. Di vê pirtûkê de beşek jî Îlahîyatên Xiristiyana jî hene û jî 108 rûpelan e. wêne/2.


5- Di sala 1891ê de, Incîla- Metta- bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî û ji aliyê -civata kitêba pîroz a Amerîkî- de li Stembolê hate çapkirin û weşandin. Ew bi destûra wezaretê Me'arîfa Osmanî hate çapkirin. Ev kitêb jî 148 rûpelan pêk tê.

6- Incîla - Marqos- li sala 1911ê bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî li Stembolê hate çapkirin û weşandin, û ev kitêba jî 87 rûpelan pêk tê.

7- Incîla - Luqas- di sala 1911ê de li Stembolê hate çapkirin û weşandin, ew jî bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî ye û jî 148 rûpela pêk tê

8- Incîla - Yanna- ji 109 rûpelan pêktê. Di sala 1911ê de li Stembolê bi zimanê Kurdî û bi tîpên Ermenî hate çapkirin û weşandin

9- E'melê Resûlan: Di sala 1911; de li Stembolê hate çapkirin û weşandin. Ew bi



zimanê kurdî û bi tîpên Ermanî bû, û jî 138 rûpela pêktê.

10- Incîla- Metta- di sala 1922an de li Stembolê bi zimanê Kurdî û bi tîpên Erebi hate çapkirin û weşandin, û jî 104 rûpela ne.- wêne3-

11- Incîla- Markus- di sala 1923an li Stembolê hate çapkirin û weşandin, ew bi zimanê Kurdî û bi tîpên Erebi bû û jî 106 rûpela pêk hatiye

12- Incîla- Luqa- bi zimanê Kurdî û bi tîpên Erebi di sala 1923an de li Stembolê hatiye çapkirin û weşandin.

Tiştê balkêş di wan wergerandinan de, ciwaniya wergerandinê ye. Ev du nimûne jî wan:

Di çapa sala 1880 de ku li Xarpêtê hatiye çapkirin de wiha hatiye: ((*Agir dojê qet kê m nabe, Kezeb dişewite, hênik nabe. Hêvî mical tene birîn. Betal nabe şîn û girîn. Bihûşt çi cîkî şêrin e. veke kitêb û bi xwîne. Delalê dil hev dibînîn. Tehlî tenkê ket nebînîn*)).

Di çapa sala 1922an de jî wilo hatiye: ((*... û welidîna Îsa Mesîh bi vî terzî bû: Hingî ku diya wî Meryem ji Yûsif re nişankirî bû, berî ku bine ba hev, ji Rûhê Paqij bi hemle xuya bû. Û méré wê Yûsif çunku merivekî salih bû, nexwest wê bihetkîne, fikirî ku bi star wê berde. Lê çaxa ku ewî bi ev tişt difikirî, melekê Reb di xewnê jê ra zahir bû û got: Ey Yûsif kurê Dawid metirse ku jîna xwe Meryem ji xwe re bistîni. Çima ku yê di hindûrê wê da welidî ji Rûhê Paqij e. Û ewê kurekî bine û navê wî Îsa deynî.....hwd*)).

Salvegera heştan a goçkirina heval Edîb Îbrahîm.

Li roja 26ê
meha
Gelewêjê, dost
û hevalê
pakrewan
Edîb Îbrahîm li
ber gora wî li
goristana
Gundê Maratê



salvegera wî ya heştan bi bîr
anîn. Piştî xêrhatinê û pêşwazîki-
rin mêvavan, hevalên komîta
hêrmî ya Partiya Yekîti ya
Demoqrat a Kurd li Sûryê ev gotina bi navê rêxistina
Efrînê ya partiyê bi wê boneyê xwend:

Xwîşk û birayên hêja û delal..

Rêz û silav ji we hemiyar re, dost, heval û xelkê
gundê Maratê. Îro em li ser gora hevalê me yê nemir ma-
moste Edîb Îbrahîm/ bavê Pêşrew/ kom bûne... bi boneya
bîranîna heştamîn a koçbarkirina wî ji nav me. Ew di roja
18ê Gelewêja sala 2007an de li welatê Almaniya, çû ser
dilovaniya Xwedê, û piştî çend rojan, li gor daxwaza wî,
ew li goristana gundê Maratê di roja 26ê Gelewêja sala
2007an de hate binaxkirin.


Gelî beşdarên bi rûmet..

Mamoste bavê Pêşrew hevlekî dilsoz, rastgo û merd
bû, herwiha jî rewşenbîr û mirovhez bû, wî li gelek
gundên herêma Efrînê mamostetî kiri bû, bi sedan keç û
xort berve xwendin û zanînê didan. Di dirêjîya 35 salan
de ew partîzan bû di nav refên partiya me de, û pir xelk
fêrî zimanê zikmakî jî kiri bû. Wî bi dilsozî siyaseta
partiya xwe diparast û daxwaza biratiya Kurd û Ereban
dikir û li hevkirina hêzên welatparêz û demoqrat jê re
bibû qisaweteke pir mezin. Beşdarên hêja..

Bavê Pêşrew ji nav me barkir lê fikir û ramanên wî, dê
her tim di hiş û dilê me de bimînin û em soz didin ku li
ser riya wî û ya PYDKs berdewam bin. Hezar silav li gi-
yanê mamoste Edîb bin.. Hezar silav li cangoriyên aza-
diyê bin. Bijî aştî azadî û wekhevî.

Rêxistina Efrînê PYDKs- Yekîti

Rêxistina DAIŞê zanyaran dikuje û kelepûra sûrî ya cîhanî wêran dike.



■ Li roja 18ê Gelawêjê,
zanyarê şûnewaran ê
Sûryê yê navdar Xalid
El Es'ed ji hêla rêxistina
DAIŞê ya têrorîst ve
hate şerşêkirin û govde
wî yê bê serî jî bi
stûnekî şûnewarî ve
hate girêdan.

Xalid El Es'ed li sala
1933an ji dayîk bûye. Û
ji sala 1963an û ra sala

2003an rêvebirê şûnewar û kevnexaneyê
Bajarê Tedmura Sûrî bû. Wî li dirêjîya çel
salî ji jyana xwe dora /40/ pirtûk li ser
şûnewaran çêkirin, li gel bi dehan ji
komên lêkolîner re xebitî û gelek xelatên
navdewletî jî wergirtin. Li gora ku li ser tê
gotin, ew ferhengê bû ji şûnewarên Ted-
murê û Sûryê re, û zanyarêkî Sûrî yê nav-
dar û naskirî bû. Bila serê gelê Sûryê xweş
be û rûyê têrorîstan reş be.

■ Li Meha/8/2015an, Daişa têrorîst per-
stgehên ``Be`lişmîn- Xwedêyê Ezmên`` û
``Bêl`` bi teqemeniyên teqandin û beşê
mezin ji wan hilweşandin. Ew du perest-
gehên dîrokî û pir navdar in, ya yek li sala
17an û ya diwem jî li sala 30 zayînî hati
bûn avakirin. Û li seranserî cîhanê bi
mezinbûna xwe navdar bûn.

■ Li roja Pêncşemê 20ê Gelawêjê. Dêra
Mar Ilyan a dîrokî ku li ber bejarokê
Qerîtên li Rojhilata bajarê Homsê bi 85/
km hilweşand. Mar Ilyan dêreke Suryanî
ya kevin e, li sedsala pêncan zayînî hatiye
avakirin. Ji wê demê de û ta dawîya sed-
sala hevdehan ew şên bû, nasik tê de dijîn
û jiyana nasiktîyê tê de diparastin û di-
borandin. Di van bîst salên dawîn 11

LI WIR**Yûsif Îbiş**

Li rawestgehê
ew giştî li hêviya sibê ne
pir bi coş in
lê..
tarûmar in
nizanin ku li aliyê şaş sekinîne.

Bavekî
destê keça xwe girtiye
dê bigihîne dibistanê
qet nizane
ku hêla din
wan li hember
dergeha gorsitanê peya dike.

Geştiyarek
ew jî mîna hemiyan
li rawestgehê sekinî
dixwaze..

serdana taxa azadiyê bike
lê nehat serê wî
ku ew li aliya şaş e
li aliya koça dawiyê ye
li rêya koçberiyê ye.

Nêçîrvanek
ew jî li wir e
bi tîr û çek e
lê nizane avjeniyê bike
pir caran ew diçû daristanê
xewna xwe nêçîr bike
lê vê carê
ew çû deryayê

xewna xwe bikuje.

Li wir
li rawestgehê
ew hemî tî û birçî ne
ew hemî winda ne
ew hemî Kurd in

RÊWIYO...!**Gulistan Awaz**

Di roj û şevên nûjyana te de
gulistanên yasmîn û nêrgizan
diçandin
ji bîr meke..

ew ji bihna min bûn

Di şevpestiyên xewnên te de
çemên stêrkan diherikandin
bihuştê dema periyên vedijand
ji bîr meke..

ew hembêza min bû

Looo..rêwiyo..!

Êş û xweşiya di bedena min de
geş bike

û ji bîr meke..

bêhin û hembêza

dayîka te bi te re rêwî ne..

Bi heyva temenê te

yê şermok re

rêwî ne şemalên dilê dilovan dilê te

dorpêç kirin

Û

bi te re rêwî ne.

Welatê min**Mihemed
Hesên**

Bi hêvî me
Hêviyên biçûk
Li ser xaka te
Bijîm
Di hembêza te de
Her sibehê
Bihna xunava te bikim
Çermê laşê xwe
Di bin tîrêjên
Roja te de
Reş bikim
Û
Êvarên xwe
Bi kurmikên şevên te re
Bidomînim
Welatê min
Biçûk in hêvî
Razîme
Xizan
Perîşan
Li rex te
Bijîm
Hêviya min
Ew e ku
Li dawiya min
Di mizgefta gundê min de
Bi dengê
Mileyê gundê me
Were raghandin
Mirina min
Welatê min

Malava = Spas

Li gund, dema ku yek di ber malekê re diçû, silav dida xudiyê/ya malê, wî/wê jî lê vedigerand û digot: Kerem ke! Wê/wî jî lê vedigerand û digot: Malik ava, mal ava, malava.

Yekî pere ji yekî dên dikirin, dîsa jê re digot: ``Mala we ava`` wekî ku we bi destê me girt.

Barê yekî diket, hevalê wî radihiştê û alîkariya wî dikir û barê wî serast dikir, weke ``spasî`` jê re digot: Mala te ava keko wekî ku te alîkariya me kir.

Diçûn xwazgênciyê, piştî erêkirin û birîna qeleng, ji xudiyê keçikê re digotin: Hezar û pêncsed car mala we ava, weke ku we mirovantiya me pejirand û we barê me jî giran ne kir.. Ji van mînakan xuya dibe, ku gotina ``malava`` bi wateya ``spas`` dihat bikaranîn û bikardayîna wê radibû. Ew ji koka xwe û ji hêla wateyê de wiha tê (mala we ava)

، *belê ew bi renekî tekûz û diyar weteya ((spas)) dide û şûna wê bi sergihayî digire. Loma jî li şûna bêje û têgeha ``spas`` ku dibêjin ji koka xwe de Rûsî ye, em kanin -bê erêna- bêjeya ((Malava)) bikar wînin. Wê hîngê jî wê baştir be ku mîna yek bêje were bilêvkirin û nivîsandin ((Malava)). Ew bêjeyê Kurmancî û resen e, xudî wateyê zelal, şêrîn û watedar e, ji dîroka me ya civakî û çandeyî de jî ji me re maye.*

Mala we ava, malik ava, mal ava, malava wekî ku we guh da me, nivîsara me xwendin û ji karmendên rojname we Newroz re got: Malava, destên we sax bin.. zor spas.

Bîranîna Helbestvanê ...Dûmahîk

Gorbuhiştê nemir, helbestvanî û xebatkarî ji bavê xwe biriyê û hezkirina zimanê kurdî jî ji dayîka xwe wergirtiye. Loma jî ew zû derbas nava helbestê û xebatê bû.

Gelek dîwanên wî yên helbestî derketin, jê dîwanên: Daniştekê, Xaç, Mar û Rojewa Helbestvanekî, Du Sirûdên Çiyayî.

Gelek berhemên wî bo zimanên Erebî, Firensî; Îngilîzî, Almanî û hin din jî hatine wergerandin.

Li sala 1988an xelata Toxoskî ji Siwêdê wergirt. Li sala 2001ê Xelata Pîremerd a helbestê li Silêmaniyê wergirt. Li sala 2005an jî xelata ``Enqaa ya Zêrîn`` a Îraqî wergirt.

Helbestvanê gewre Şêrko Bêkes li paytexta Siwêdê ``Stokholmê`` serê xwe danî û li Kurdistanê hate veşartin.

Jin û koçberî

▪ Vejîna Kurd

Koçberî yek ji girîngtir mijarên ku di van rojan de li ser alavên ragihandinê tê gengeşekirin, û bandorên wê yên neyînî û girîngiya civakê bi ciwanan stûna wê mijarê ne. Sedemên koçberiyê naskirî ne: Cenga berdewam, têkçûna ewlehiyê, tunebûna kar, rewşa aborî ya xirab û nakokiyên di navbera aliyên siyasî de....

Bêguman bandorên wê diyardeyê jî berçav in, û di heman demê de neyînî û cihê metirsiyê mezîn in... Lê di baweriyê me de, piştî welêt, yekemîn kesê ku ziyaneke mezîn ji koçberiyê dibîne ``jin`` e.

Ji ber şerê navxweyî û pirsgerêkên aborî, xizanî û betaliyê, xortên Kurd neçar dibin berê xwe bidin welatên biyanîyê, kolanên bajêrên me ji wan vala dibin û herweha di civaka kurdî de, rêjeya xortan kêmtir dibe.. li aliyekî din jî, rêjeya keçan bilindtir dibe, ango hevsengî çênabe...û herwiha pirsgerêkeke nû di civakê de peyda dibe, ew jî mênêkirin e... Jinên ku li welatê xwe xwedî derketine û koçberî nepejirandine- bi taybetî jî keçên ku di temenê zewacê de- him barê xizanî û rewşên heyî, him jî barê tenahî û mênêkirinê radikin, û herweha rêjeyek bilind ji keçên me bê zewac dimînin. Bêguman ev rûdawa jî bandoreke neyînî li ser derûna wan dike û civakê kulek dike.. Pir caran, ji neçarî, û ta ku keç xwe ji metirsiyên wê pirsgerêkê biparêzin, yekemîn kesê ku ji bo zewacê li deriyê wê dixîne, wî dipejirîne, bi hişmendî û bîrûbawerî di pirojeya zewaca xwe de naramê... û di paşerojê de pir caran nakokî di navbera wan her du hevjinan de peyda dibin, û wilo ew vebjartina şaş û ne durust ji destpêkê de dibe sedema jinberdanê û hilweşandina malê.. Di van rojan de, li Rojavayê Kurdistanê, zewaca keçan pir zehmet û êşbar e, û keça ku derfeta zewacê bi dest dikeve, ew bi bext û şans e!!!

Dîroka gundekî**Gundê Babasî***Wergerandin: Mihemed Zekî Mihemed.***... Dûmahîk**

di navbera herêma (Aliyan) û herêma (Cerehê)de, ew ji aliyê rojava ve gundê dawî ye ji herêma (Aliyan) û ji bakur ve sînordarê gundê (Şêtika) û sînore Turkiyê ye, ji başûr ve jî gundê (Maşoqa) ye, rojhilatî wî jî gundê (Elî Bedran) e.

Ji hêla kargeriyê ve û li gora dabeşkirina hikumeta Sûriyê bi navça (qeza) Çilaxa ve girêdayî ye, lê li gor dabeşkirina kantona Cizîrê bi navça Tirbespiyê ve hatiye girêdan, Babasî dora 25/km an ji Çilaxa û dora 21/km an ji Tirbespiyê dûr e.

Gundê (Babasî) di navbera sala (1930-1935)an de hatiye avkirin û ji cîwarbûnê re amade bûye.

Rûbera xaka çandiniyê (4000) donim in, birinc, pembû, darên bergir û deştane (spîndar, sindiyan...) û hemî cureyên şînkayî û çandinyên bejî lê dihatin çandin, lê bi sedma kêmbûna baranê çandina cureyên şînkayî rawestiye, û ji wê rûbera çandiniyê tenê (800) donim mane, ji ber ku gund kete ber pirojeya xeta dehan ya ku (Çembera Erebi) ya nijadperest û kirêt, û bi wê bihaneyê zeviyên Kurdan ji destên wan girtin û ji (800) donimê (400)

donim li malbata (Kini'o) û (400) li malbata Hecî hesen hate belavkirin.

Lê belê, nivê arziya gund a ku li malbata Kini'o vedgeriya, Hisênê Osê kirî û nivê dî yê Elî Zilfo û malbata Haco bû, piştî demekê malbata Haco dest danîne ser û (80%) ji berhemê çandiniyê dibirin û weke bacê bû (Hasil) dihate binavkirin, niha gundî bi keda destê xwe û xwedîkirna sewal û cureyên din ji ajelan jiyana xwe dibûrînin.

Berî ku şoreşa Sûriyê di sala 2011 an de dest pê bike hejmara xaniyên ku jiyan di wan de dibû (50)î xanî û (600) kes bûn, lê niha jimara xaniyên ku jiyan di wan de berdewam e (30)î xanî û (150) kes in, piraniya jimara ku maye, jin, zarok û kalmêrin ango ji xort û ciwanên berhemdar vala ye.

Lê yên mane arziyên xwe diparêzin û bi xaka bav û kalan ve girêdayîne, û puxteya kocberiya ku çêbûye , bêpariya şênîyan ji mafê welatîni, xakê, stem, belengazî û leşkerî jî di vê rewşê de xwedî bandor e.

Hêjayî gotinê ye ku piraniya şênîyên gund ji hoza (Saliha) ne, tevî ku hin malên ji hoza (Dilmemka û Seyida) ne û gundî hemî bi ola xwe Misilman in.

Hin xizmetguzariyên sivik li gund peyda dibin, mîna bîreke tirwazî, dibistaneke qunaxa sertayî û riyeke qîrkirî di ber gund re diçe.

Ji bilî xurista gund a sur û spehî gelek sernavên din hene ku Babasî kirine gundekî awarte, yek ji wan Ciwa Hezex, ku xirstyanên (Fileh) Hezexê kola bûn, ji Babasiyê dest pê dîke û bi aliyê gundê Maşoqê de diçe, wisa jî kaniyek lê heye û bi (Kaniya borangeh) tê binavkirin, hewheha ew gundekî pîroz e jî ji ber ku gora (Pîrozgeha) Şêxekî ku bi navê (Şêx Miheme) navdar e di gund de ye.

Tevî spehîti û sernavên Babsiyê jî, xwedî dîrokeke berçav e di xebat û têkoşîne de, serê mirov ji ber bilind e, ku ji kevin de navendeke netwayetiyê bû, ji ber vê xebat û rûmet bi (Gelala) di nav gundên herêmê de dihate naskirin, ango Babasî ya mêrxas û wêrek gundê pêşîn bû ku bi hawara gundê (Dêrûna Qulnga) ve çû , dem ku hêzên Turkiyê êrîşî wî gundî kirin, di encama wî şerî de ku bi (Şerê Dêrûna Qulinga) navdar e, efserekî Turk hate kuştin.

Tevî nîrên zor û dijwar ku ev herêma Kurdî tê re derbas dibû, kongirê diwem yê yekemîn pariya Kurdî (Partiya Dîmokrat a Kurd) di sala 1977an de li Babasiyê hate lidarxistin.

Hêjayî gotinê ye ku apê Ehmed Yasîn ji gundiyên herî kevnar û temen dirêj e, li ser avkirina ev gundê mêrxas û pêşewe bîner e .

Navça Ewle ... Dûmahîk

istratîciyekê ye.

Tirk vê carê dereng hişyar bûn

Mirov dibîne, ku destlatdarên Tirkiyê vê carê dereng li xwe hayî bûn. Navça giring û gerek bû ku di bin kontirola wan keta navça Girê Sipî bû. Lê rizgarkirina wê navçê li ser destê hêzên kurdî, bû wek jehrê û Tirk jî neçar bûn wê daqurtînin, loma jî ew vê carê fersendê nadin tu kesî ku derbas gundewarên Bakurê Helebê bibin; di vê babetê de helwesta Tirkiyê wiha tê têgihîştin: ((Yan em û hevalbendên me yan jî DAIŞ wê li herêmê destlatdar be, lê ji Kurdan re na)). Ev yeka jî gizgiziyê li ba Emerîkanan çê dike, ji ber ku baweriya wan pir bi helwest û siyaseta destlata Tikiyê ya niha netê, bûye salek e ku Emerîka doza şerê DAIŞê ji Tirkiyê dike, lê wê xwe ne dilivand, na belê hîn alîkariya hêzên tundrew û belkî DAIŞê bi xwe jî dikir. Ew jî tiştêkî ne veşartiyê û li ber çavên mîdiyayê tê kirin.

Derdê Dewleta Tirkiyê ji navça ewle ne teror û terorîst in, derd û kula herdem Kurd in, Emerîka jî û tevahiya raya cîhanî jî li wê yekê haydar in, loma jî eger dewleta Tirkiyê deh navçeyên ewle ava bike, wê tê de bi ser nekeve, û serkeftina dawîn wê ya gelê Sûryê be.

Rêxistina DAIŞê ... Dûmahîk

de jî, rahib Pawlo Delîlyo ku ji bêtirî du salan de li bakurê Sûryê ji hêla çekdarine nanas ve hatiye revandin, dêr û jiyana nasiktiyê ji nûve vejand, û deriyê wê ji seredanî û bawermendan re vekir, û ew kir navendek ji biratî û çanda olan re.

Gava ku rêxistina têrorîst destê xwe danî ser bajarokê Qerîtên, wê serokê dêrê Baba Ye`qûb, rahib Bitris û bi sedan filehên bajarok jî girtin û revandin û çarenûsa wan jî hîn ne diyar e.

Hêjayê gotinê ye, ku ji du salan û vir de, jerkî ku ev rêxistina têrorîst li Sûryê û Îraqê derketiye û destdirêj bûye, bi sedan pîrozgeh, şûnwar û kaviên şaristaniyên kevin ên zor hêja yên gelên Rojhilata Navîn wêran kirine, di serî de şûnwarên bajarê Nemrûd û Nînewaya Aşûriyan.

Şûnewarên dîrokî arzûya tevahiya gelên cîhanê ne. Loma parastina wan jî berpirsiyariyeke tevane ye, û ustubariya her sazî û aliyekî navdewletî ye. Eger îro têrorîstan ew şûnewar wêran kirin, wê sibe bê tirs û hesab, şûnewarên mîn ên Tedmurê jî hilweşînin.

Partiyên Kurdî ... Dûmahîk

hemiyane de ye.

Di pişt re aliyê T.V.D û partiyên di bin sîwana wê de pirojeya Rêvebiriya Xweser ragihandin. Di wê demê de piraniya partiyên kurdî nerazîbûna xwe nîşan dan, û ta roja îroyîn jî bi tundî şerê vê rêvebiriyê dikin. Ev rêvebiriya ku îro li herêmên Kurdî ji aliyê T.V.D ve tê rêvebirin. Ew bi xwe pirojek e, lê ta kîjan astê ew li gor berjewendiya gelê me yê Kurd li Sûryê ye, yan kêmtir û zêdetirî wê ye, ew karêkî din e, lê bi şewakî piratîkî destê û sazî hatine avakirin, û kar dibe. Lê li aliyê din, ango yê

partiyên Kurdî yên ku nerazîbûna xwe ji vê rêvebiriyê nîşan didin, gel ji wan dipirse: Kanî pirojeya we? Kanî lihevkerin û yekrêziya we? Ji bo çi karê Encûmenê dihate likumandin, ta ew têk çû? Çima ev partî nikarin bi hev bawer bikin, û bi yek dest li gel hev kar bikin? Çima... çima ..???

Eger bi şewakî rasteqînî nêrîna gel di derbarê kar û rewşa partiyên Kurdî de were birin, rêjeyêke bilind ji gel dê nerazîbûna xwe nîşan bide û rêjeyek jî nema baweriyê bi van partiyên dike. Ev rastiyeke û bila tu kes wê li zora xwe nînin.

Ma gelo ne şermeke giran e, ku temenê tevgera Kurdî ya rêzanî li Sûryê pênçî sal derbas kiriye, û hîn şeweyê kar û xebata kilaşîkî û wek ya salên heftiyî mane? Wan tiştêk li rêbazên xebatê zêde nekirine, tenê ji hev qetiyane û partiyên pûç pir bûne. Ne tenê wiha, lê belê em di sed-sala bîst û yekê de ne, û hîn partiyên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê bê ragihandina li gorî demê ne. Birastî; eger partiyên kurdî li xwe venegerin, şeweyê xebata xwe serast nekin, ji xewa partîtiya teng hişyar nebin û yekrêziyeke rasteqînî ava nekin, roj bi roj gunehê wan girantir dibe.

Wênêkêş Remzî Reşa koça dawî kir

▪ Şukrî Dedo

Roja Înê 24.07.2015an li bajarê Parîsê, Wênêkêşê Kurd Remzî Reşa koça dawî kir, û bi beşdariya dost û hevalên wî li gorîstana Montmartre- Parîs hate veşartin.

Hunermendê nemir li bajarê Qirixanê – Turkiyê sala 1928an ji dayîk bûbû, ew ji malbata Reşa ya Kurd a di herêma Kurdaxê de bi nav û deng e. Wî di diwanzde saliya xwe de wênê çêkirin, û di hevdesaliya xwe de jî di pêşngeheke hevbeş de li Qirixanê beşdar bû. Û çend salan di dibistanên bajarê Entakiya de xwend.

Sala 1947an, derbasî Akadimiya Istenbûlê ya hunerên ciwanan bû, û di salên 1950-1952an de tevî hin hevalê xwe giropa " Deh Wênêkêşan " damezrandin, û bi hin çalakîyên balkêş rabûn.

Nemir R.Reşa, di sala 1953an de çû bû bajarê Parîsê da ku hêviyên xwe di jiyana de bicî bîne, û li wir D.Kamêran Alî



Bedirxan nas kir. Tabloya Qirixanê di dilê wî de bû, û

li dirêjahiya 62 salan ji temenê xwe li Parîsê borand, gelek tabloyên giranbuha li ser êş û keda xelkê amade kirin û bandora reşantiya jiyana Kurdan di wan de aşkere bû.

Nemir R.Reşa di pir pêşngehan de hevpar bû û hinên taybet jî çêkirin, yek ji wan di Mûzeyeke Parîsê de hat vekirin. Ew wek kesayetî ciyê balkêşiya kesên rewşenbîr û xelkê bû. Ew hevalê Wênêkêşê Turk Fîkret Mî'ele bû. Wî li sala 1982an tevî mamoste Kendal Nezan û hinên din Enistituya Kurdî li Parîsê damezirandin.

Wî bi asteke bilind zimanê Firansî dizanî, û têkliyên xurt bi



Firansiyan re girêdan, ji nav wan xanima nemir Daniyêl Mîfîran bû. Ew di sala 1974an bi keçeke Firansî re zewicî, û keçeke wan hate dinê, ew jî kurditiya xwe baş dinase.

Tiştê balkêş ew e, ku nemir R.Reşa li nasnameya xwe ya kurdî xwedî derdiket, û bi zimanê dê, zarava Kurdaxê ya kurmançî ya sivik û nazik daxivî.

Yê ku dixweze guhdarî guftugoya rojnamevan Arif Zîrevanî di TRT-6, sala 2009 de pêre kiriye bike, dikare li vê vîdoyê temaşeke:

<https://www.youtube.com/watch?v=qazJV9DNw8Q>

Hemrîn Cefer

Lehenga Almaniya di Lîska "Kulmdanê" de.

Keça Kurd Hemrîn Ce'fer, ji koka xwe de ji gundê Be'dîna-Efrînê ye û li sala 1997an li Almaniya hatiye dinê. Ew ji çar salan de di warê werzişê

Kulmdanê^{boksê} de perwerde dibe û dilîze. Wê li vê dawiyê pileya yekem di kulmdanê de "giraniya per" li ser asta Almaniya wergirt û wek baştirîn lîstikvan jî hate binavkirin. Azweriya^{timûh} wê ew e, ku bibe lehenga yekem li ser asta cîhanê. Hêjayê gotinê ye, ku Hemrîn şagirta pola bekeloriya

ye û zimanê xwe yê Kurmançî parastiye û baş pê daxive.



Bijî keça Kurd Hemrîn. Li gel serkeftinên mezin.

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com